

Daxuyanîyeke Şermezarkirina Armanckirina Rêxistinên Civaka Sivîl ên Sûrîyeyî

Em rêxistinên sivîl ên jêrîmzeker, êrîşên dûbarekirî li ser rêxistinên civaka sivîl ên Sûrîyeyî yên ku li herêmên Sûrîyeyê yên cûrbecûr kar dikin, şermezar dikin. Her weha piştgirîya xwe bo van rêxistinên ku rastî hemû cûreyên fişar û bînpêkirinê tîn da ku karê xwe yê ji bo civaka Sûrîyeyî rawestînin, nîşan didin. Êrîşa herî dawî li ser navendeke berevanîya sivîl a Sûrîyeyî li bajarê Sermîn ê Bakurê Sûrîyeyê bû, her weha êrîşine din ku ofîseke sê rêxistinên civaka sivîl li Dûmaya Başûrê Sûrîyeyê ji xwe re kiribûn armanc.

Di 12ê Tebaxa 2017an de, navenda berevanîya sivîl li Sermîna Gundewarê Êdlêbê rastî êrîşeke çekdarî hat di encamê de hemû karmendên li ofîsa navendê ku hejmara wan heft kes bû, hatin kuştin û navend hate dizîn. Di 13ê Tebaxê de, grûpele (Elhîrak Elşeibî) ya girêdayî Artêşa Elîslamê, êrîşî ofîsa ku her sê rêxistin: Naveda Bibelgekirina Bînpêkirinan li Sûrîyeyê (VDC), ofîsa Geşepêdana Navxweyî û Piştgirîya Projeyên Piçûkn û Tora Hurasê li Dûmaya Gundewarê Şamê kirin. Êrîşkeran li karmendên ofîsê û kesên li ofîsê xistin û ziyar gihandin ofîsê her weha hin alav dizîn û gefa şewitandina ofîsê jî xwarin.

Tevî ku armanca van êrîşên berdewam li ser civaka sivîl ew e agahdarkirina karmendan bi neewlehîya kar û sorkirina wan da ku ji vî karî dûr bikevin, lê civaka sivîl a Sûrîyeyî gelek caran soza xwe daye ku ew dê ji bo gelê Sûrîyeyî û çesipandina mafên mirovan her dem kar bike, di axaftina xwe ya der barê bûyera ku 7 karmendên berevanîya sivîl jê re bûne qurbanî de, Raid Elsalih; birêvebirê Berevanîya Sivîl a Sûrîyeyî [got](#): “zehmeta ez bi gotinan pesnê hevalên xwe yên şehîd bidim, her yekî ji wan gelek çîrokên hêvîyê di wan giyanên ku alîkarîyan wan kirine de û bi hawara wan ve çûne, hiştine. Serê min bi karê wan yê mirovî û mîrateya ku li paş xwe hiştine bilind e. em sozê didin gelê Sûrîyeyê ku em ji ber vê tawanê xwe natewînin û em ê her dem di xizmeta wan de bin.”

Êrîşên ku li dijî çalakvanên mafnasî û karmendên civaka sivîl ne diyardeyeke nû ne, gelek bînpêkirinên cûrbecûr hatine bibelgekirin. [Daxuyanîya](#) ku ji aliyê Ofîsa Geşepêdana Navxweyî û Piştgirîya Projeyên Piçûk diyar dike: “armanc ji vê hewldana nû tirsandina tîma me ye da ku bûyerêb sala 2013an û encama wê ya ku revandina her çar hevkarên me Rezan, Semîra, Wail û Nazim bû bînin bîra me ku ev kes ji şeva 9ê Berfanbara 2013an ta îroj ji heman ofîsê hatine revandin û windayî ne.”

Rêxistinên Civaka Sivîl roleke sereke di xizmeta sivîlan û bibelgekirina bînpêkirinên ku wan armanc dikin, digerin, weke ku daxuyanîya Ofîsa Bibelgekirina Bînpêkirina diyar kir: “Mixabin ev êrîş di dema bîranîna çarem a komkujîya kîmawî de ku ji aliyê hikûmeta Sûriyeyî ve di 2013an de li Xutaya Şamê hate pêkanîn, çêdibe. Navendê roleke xwe ya sereke di bibelgekirin û qeydkirina qurbanîyan de gerand weke beşekî sereke ji karê xwe yê bibelgekirina bînpêkirinan bi armanca peydakirina wekhevîyê bo qurbanîyan û cezakirina tawankaran.”

Li gel ku em aştîyê ji giyanên şehîdan re û rehetîyê ji birîndaran re dixwazin, em ji civaka navdewletî û aliyên mafnasî dixwain ku:

- 1- Van bînpêkirina şermezar bikin.
- 2- Piştgirîyê bidin rêxistinên civaka sivîl bi hemû awayan da ku karibin xwe û karmendên xwe biparêzin.

Kesên îmzeker (1) berpirsyarîtiya silametîya karmendên civaka sivîl li mile desthilatên herêmê bar dike (2) ji wan aliyên dixwazin ku hemû kesên beşdar di vî karî de an sorkirina li ser van tawan û bînpêkirinan de bigirtin û radestî dadgehan bikin her weha (3) teqezkirina pabendîya van hêzan bi nenêzîkbûna ji karmendên civaka sivîl û peydakirina parastinê ji wan re dema ku pêwîst bike.

Îmzeker:

1. Al-Bab City Coordinating
2. Al-Kawakibi Organization For Human Rights
3. Al-khadraa organization
4. Al-Marsad | Arab Human Rights Centre in Golan Heights
5. ANA PRESS
6. Badael Organization
7. Baytna Syria
8. Bihar relief organization
9. Citizens for Syria
10. Comunita' Araba Siriana in Italia
11. Dawlaty organization
12. Emissa for Development
13. Fraternity Foundation for Human Rights-Birati
14. Free Syrian Lawyer Association
15. Foundation of Syrian civil society organization
16. Human Rights Guardians
17. Jazour society Training & Development
18. Justice For Life Organization
19. Kawakibi Center for Transitional Justice and Human Rights
20. Kesh Malek
21. Local Administration Councils Unit LACU

22. Local Coordination Committees of Syria
23. Local Development & Small-Projects Support (LDSPS)
24. MADA Center for Studies and Development
25. Mouwatana For Civil Action
26. Najda Now Organization
27. PÊL- Civil Waves
28. Raqeeb Institute for Monitoring and Documentation
29. Sanad Organization
30. SHAML coalition of civil society organizations
31. Start Point organization
32. Syrian activists monitoring organization
33. Syrian Archive
34. Syrian Center For Legal Studies and Researches
35. Syrian Center For Media and Freedom of Expression
36. Syrian Center For Journalistic Freedoms
37. Syrian Feminist Lobby
38. Syrian League For Citizenship
39. Syrian Network for Human Rights
40. Syrian Nonviolence Movement
41. Syrian Women's Network
42. Syrians For Truth and Justice
43. The Day after
44. The Syrian Journalists Association
45. The Working Group for Syria
46. The Working Group for Syrian Detainees
47. This is my life organization
48. Violations Documentation Center in Syria (VDC)
49. Women Now for development